Ronahî — şopdara rastiyê ye
Hejmar : 381 nameronahi@gmail.com 16 - Gulan - 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

# Rojî hat, rewşa koçberan zehmet e

Koçberên kampa Eyn Îsa li bin konên xwe li benda meha rojiyê (remezan) ne. Lê dibe ku ji ber zehmetiyên jiyanê nikaribin rojiyê bigirin.
Koçberên kampa Eyn Îsa ya Kantona Girê Spî li bin konên xwe de li benda rojiyê ne, lê dibe ku ji ber rewşa koçberiyê û zehmetiyên jiyanî nikaribin rojiya xwe bigirin.
Kampa Eyn Îsa 13 km dikeve başûrê bajarê Reqayê. Piraniya şêniyên kampê ji herêmên di destê rêjîma Baas de reviyane. Li kampê hemû xezanên ava vexwarinê li ber rokê hatine bicihkirin û ava wê germ dibe. Bi vê yekê koçberên ku rojiyê bigirin nikarin fitara xwe bi ava cemidî vekin.
Li aliyekî din jî konên ku welatî lê bi cih bûne, wan ji germa havînê naparêzin, ji ber ku kon ji naylon û pembo hatine çêkirin û ceyran li kampê nîne. Ji ber vê yekê welatî neçar dimînin ku di saetên nîvê rojê de ji konan derkevin û li siya wan rûnên.
Koçbera bi navê Ebîr Hisên a ji bajarê Bûkemalê da zanîn ku rêxistinên alîkariyê pêdiviyên havînê pêşkêşî wan nakin û wiha got, ”Derfetên me tune ne, em ê çawa di vê havîna germ de rojiyê bigirin.”
Koçberê bi navê Ehmed Hemûd ê ji bajarê Reqayê diyar kir ku ji ber germa havînê dê rojiya îsal zehmet be û wiha got, ”Konên ku em lê dijîn me ji germa havînê naparêzin û ava cemidî li gel me nîne. Di rojiya îsal de em ê gelek zehmetiyan bibînin.”
Koçberan û Endamê Rêveberiya kampê Celal Eyaf ji rêxistinên mirovî û aliyên berpirsyar



xwestin ku di meha rojiyê de pêdiviyên koçberan bi cih bînin. Celal Eyaf diyar kir ku ew ê di meha rojiyê de ava cemidî ji koçberan re peyda bikin û wiha axivî, ”Me bi kargeheke bûzê ya navçeya Eyn Îsa re lihev kir û ew ê di meha rojiyê de bûzê bi buhayekî kêm bifiroşe koçberan. Bi vî awayî koçber dikarin fitara xwe bi ava cemidî vekin.”...*ANHA*

## Li Tebqayê bazirganî û xwedîkirina pez



Bazirganiya pez yek ji kevintrîn bazirganiyên herêma Tebqayê ye. Ji ber gelê herêmê debara xwe bi çandinî û xwedîkirina sewalan dike.
Bazirganiya pez ji beriya sedê salan li herêmê pêk tê. Sûka pez jî yek ji girîngtrîn sûkên herêmê ne. ji ber gelê herêmê debara xwe ya jiyanî li ser çandiniyê û sewaldariyê dike.
Di rewşên herî kêm de yê ku pez xwedî dike diçe sûkê, da ku pezên xwe bifroş in. Di sûkê de kesê ku di navbera sewaldaran de navbênkariyê di navbera bazirgan û xwediyên sewalan de dike “Delal e”. Delal ew kesê xwedî tecrubeye û ji cûreyên pez fam dike.
Sûka herî mezin li Tebqayê dikeve aliyê başûr – rojhilatî bajar. Bi navê magef (Sûka pez) tê naskirin. Roja înê kesê ku pez xwedî dikin li wê sûkê kom dibin. Di sûkê de jî beşê firotina xwarina pez heye.
Sûka mezin a duyemîn li bajaroka El-Mensûra ye. Roja şemiyê hemû bazirganên pez li wê derê kom dibin. Sûk dikeve başûr – rojhilatî bajarê Tebqayê. Her wiha sûka El-Cirniyê ya ku dikeve bakur – rojavayî bajarê Tebqayê û roja yekşemê hemû bazirgan lê kom dibin.
Xwediyê pez di saetên sibê de berê xwe didin sûka pez û bi hêviyê ku kar xwe li wê derê zû xilas bike. Ji ber vê yekê alîkariya delalê pez dixwaz in. Di hinek deman de hakim bi karê wesîle di navbera xwediyên pez dike û pirsgirêkên di navbera wan de çareser dike.
Berovajî hakim “Delal” her ku serê pezekî difroşe peran ji kesê ku dikire, digre.
Di demên berê de firotin li gorî nêrîn û destdayînê dihat kirin. Lê niha li gorî kîloyan tê kirin.
Li herêma Tebqayê kesên ku pez xwedî dikin pezên xwe di riya sembolên taybet nas dikin. Ew sembol bi navê “Muhrê” tê naskirin. Her wiha şekil û rengê muhrê ji kesekî heta kesekî din tê guhertin...*ANHA*





## *Li kampa Serdemê xebatên çandiniyê*



Şêniyên Efrînê ku ji ber êrîşên dewleta tirk neçar man berê xwe bidin Şehbayê bi xwe xwe rêvedibin. Şêniyên ku bi salan e karê çandiniyê dikin li Kampa Serdemê ji bo pêdiviyên xwe peyda bikin karê çandiniyê dikin.
Rêveberiya kampa Serdemê ya Li Şehbayê parçeyek erd ji şêniyan re veqetand, Dê tovên çandiniyê, semad û av ji aliyê rêveberiya kampê ve bêne peydakirin. Erda hatiye peydakirin firehiya wê du donim in.
Dê pêwîstiyên çandiniyê ”tovên bacanên sor û reş, xiyar, baxdenos û hwd, semad û av” ji aliyê rêveberiya kampê ve bêne peydakirin.
Cotkarê bi navê Mihemed Ehmed Silêman diyar kir ku divê av û semad were peydakirin, da berhemekî baş derkeve. Silêman wiha got, ”Em ê bi hemû keda xwe bixebitin da berhemekî baş berhev bikin. Ji ber ku piştî em ji Efrînê derketin rewşa me ya aborî zehmet bû.”
Hewa û axa herêma Efrînê ji çandina hemû cûreyên sebzeyan re guncaw e û hejmareke mezin ji gelê Kantona Efrînê li Şehbayê xebatên çandiniyê dikin.
Ev gav ji bo destekdayîna gelê Efrînê yê ji ber êrîşên dagirkeriya Tirk ji warê xwe hat koçkirin, hat avêtin.



## PKK bûye tevgereke cîhanî û hêviya gelan

***Cemîl Bayik diyar kir ku hemû kesên azadî û demokrasiyê dixwazin û armanca wan serketina sosyalîzmê ye paradîgmaya rêber Apo esas digirin. Ji bo wê jî tevgera me her ku diçe mezin û fireh dibe. Êdî ji çarçoveya Kurdistan û Rojhilata Navîn derketiye û di asta cîhanê de têdikoşe.***



■ Hevserokê Konseya Rêveber a KCK’ê Cemîl Bayik diyar kir ku rejîma faşîst a AKP-MHP’ê hemû faşîstên di dema Osmanî heta Îtihad Terakkî temsîl dike û da zanîn ku ji bo têkçûna xwe veşêrin nijadperestiyê sor dikin. Bayik wiha got, “desthilatdariya Erdogan û Bahçelî li ber mirinê ye. PKK ji bo gelên Rojhilata Navîn û sosyalîstên cîhanê bûye hêvî û pêşengtiyê dike. Hêviya her kesî PKK û paradîgmaya Rêber Apo ye.”*R-4*


Ronahî — şopdara rastiyê ye
nameronahi@gmail.com Hejmar : 381 16 - Gulan - 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

### Li hember roma reş weke îsewiyan berxwedan



*Qasim ENGÎN* *R-4*

# LI EFRÎNÊ POLÎTÎKAYA TIRK KIRINÊ



T.C.
IÇIŞLERI BAKANLIĞI
HATAY VALİLİĞİ

GEÇİCİ KORUMA
KİMLİK BELGESİ

بطاقة الحماية المؤقتة

| | |
|---|---|
| Yabancı Kimlik No / | 990[redacted] |
| Adı / | [redacted] |
| Soyadı / | [redacted] |
| Baba Adı / | [redacted] |
| Anne Adı / | [redacted] |
| Doğum Yeri / | SURIYE |
| Doğum Tarihi / | [redacted] |
| Medeni Durumu / | [redacted] |
| Aile No / | 12[redacted] |
| Uyruğu / | AFRIN / SURIYE |
| Kayıt Tarihi / | 18.04.2018 |

05.05.2018
Burhan Alparslan

### WÊRANKIRIN DIDOME

Piştî ku dewleta Tirk a dagirker û çeteyên xwe Efrîn dagirkirin zilm û zordestiyê li ser gelê Efrînê bê navber berdewam dikin. Welatiyan direvînin û dikujin, malên wan talan dikin, destdirêjiyê dikin, cihên pîroz hildiweşînin û demografya herêmê diguherînin. Herî dawî jî derket holê ku bi darê zorê nasnameya Tirk didin welatiyên li Efrînê.

### TIRK KIRINÊ FERZ DIKIN

Dewleta Tirk ya dagirker polîtîkaya qirkirinê li Efrînê pêk tîne. Hat ragihandin ku welatiyên Efrînê neçar dikin ku nasnameyên Tirk bigirin. Dîsa bi heman rengî malbatên çeteyên ku ji herêmên din yên Sûriyê li Efrînê bi cih dikin nasnameyên Tirk didin wan jî. Tê gotin ku bi vê yekê dixwazin welatiyên Efrînê bi darê zorê tevlî hilbijartinên li Tirkiyê jî bikin.

### WELATIYAN DIKUJIN

Ji aliyê din ve zilm û zordariya artêşa tirk û çeteyên wê ya li ser welatiyên Efrînê jî berdewam dike. Hat ragihandin ku welatiyê bi navê Receb Şukrî Reşîd dema ku ji kantona Şehbayê vedigeriya mala xwe ya li navçeya Raco, ji aliyê çeteyên ku di mala wî de bû, bi cih bûbûn, Receb kuştin û cenazeyê wî avêtin nava zeviyên çandiniyê.*R-2*

## Tirkiye komek çete ya nû ava dike



Dewleta Tirk ya dagirker ku hêza sereke ya kûrkirina şer û aloziya li Sûriyê ye, bi rêya komên çete hewl dide hê aloziyê kûrtir bike. Dewleta Tirk ya ku bi salan bi destên komên weke El Nusra û DAIŞ li Sûriyê ji bo xwe qad vekir û herêmên Sûriyê dagir kir niha jî amadekariyên ava kirina komeke çete ya nû dike. *R-2*

## Cisir El-Şixûr wê bikin bajarekî Tirk




Artêşa Tirk a dagirker çarenûsa Cisir El-Şixûr diyar kir. Wê tevlî Tirkiyê bikin. Dewleta Tirk herêma Cisr El Şixûr a Îdlibê wek eyaletekî xwe dibîne, her deverê dagir dike, nuqteyên çavdêriyê ava dike û bi vê yekê dixwaze demogarfiya herêmê biguhere û mîna bajarekî xwe bihesibîne. *R-2*



## Divê gelên Sûriyê li dijî fitneyan şiyar bin

Di bin dirûşmeya ”Bi yek destî ber bi avakirina Sûriyeke yekbûyî ve” Hêzên Ewlehiya Hundirîn a Bakurê Sûriyê bi rûspiyên êlên Ereb ên Bakurê Sûriyê re civiya. Piştî civînê Şêx û rûsipiyên êlên bakurê Sûriyê li hember fitneyên ku hêzên derve dixwazin di navbera gelên Sûriyê de derxin, banga yekbûnê kirin. *R-4*

## Şervanên QSD’ê gihiştin gundê Bakoz



Qonaxa Dawî ya Pêngava Bagera Cizîrê bê navber berdewam dike. Şervanên QSD’ê ku gundê Bakozê yê rojhilatê çemê Firatê ji çeteyan rizgarkirin dest bi paqijkirina mayînan kirin. Ji aliyê din ve şervanan li gundên ku dest bi paqijkirinê kirine hêjmareke zêde çek û cebilxane bi dest xistin. *R-2*

## Li Xezzayê şer: 37 kes mirin



Beriya vekirina Balyozxaneya DYA’yê ya li Qudûsê li Xezzayê bi deh hezaran Fîlîstiniyan xwestin çalakiyên protestoyê li dar bixin. Leşkerên Îsraîlê li ser xeta sînor a Xezzayê gule li xwepêşanderan barandin. Hate diyarkirin ku bi kêmanî 37 Fîlîstînî mirine û bi kêmanî 900 kes jî birîndar bûne. *R-6*

## Em ê yekîtiya Sûriyê biparêzin



■ Serokê Partiya Sûriya Pêşerojê Ibrahîm Qeftan diyar kir ku ew ê ji bo parastina sînorê Sûriyê û çareserkirina aloziyê têkîliyên bi dewletên cîran re xurt bikin. Qeftan wiha got, “Armanca me parastina yekîtiya axa Sûriyê , rizgarkirina axa Sûriyê ji dagirkeriyê û çareserkirina aloziya Sûriyê ye.” Emê ji bo avakirina Sûriyeke demokratîk xebatên xwe bidomînin.”*R-5*

## Divê Kongreya Netewî bê lidarxistin



■ Hevseroka Desteya Rêveber a TEV-DEM’ê Asya Ebdulah diyar kir ku divê gelê kurd li dijî hevkariyên hêzên dijber ku îro li dijî gelê kurd gihiştine hev, yekîtiya xwe ava bikin. Ebdullah wiha got, “Ji bo pêşî li êrîşên li dijî kurdan were girtin, divê hemû hêzên niştimanî yên Kurdistanê piştgiriya Kongreya Netewî ya Kurdistanê bikin.” *R-3*

## Divê tevgerên kurd piştgiriyê bidin HDP’ê



■ Namzedê serokkomariyê yê HDP’ê Selaheddîn Demîrtaş ku di girtîgehê de dîl tê girtin ji ANF’ê re axivî û diyar kir ku wê bi mîlyonan li ser navê wî kampanyaya hilbijartinê bimeşînin û xwest ku her malek û kargehek weke buroyeke hilbijartinê bixebite. Demîrtaş got, “partî û tevgerên Kurdan pêwîste di vê demê de li cem HDP’ê cih bigirin û sekneke dîrokî nîşan bidin.” *R-5*

## HDP hêvî û baweriya gelan e



■ Di hilbijartina 24’ê Hezîranê ya zordest de Partiya Demokratîk a Gelan HDP’ê têkildarî hilbijartina serokomariyê û parlamenteriyê danezana xwe li Enqereyê bi civînek berfireh bi raya giştî re eşkere kir. Hevseroka Giştî ya HDP’ê Pervîn Bûldan di civînê de axivî got , “HDP hêvî û cesareta gelan e. Em nasname, bawerî û çanda vê axê ne. Teqez emê bi serkevin.” *R-2*

## Li Başûr û bakur 18 leşker û kontra hatin kuştin

*R-2*

# Tirkbûyînê li Efrînê ferz dikin

***Piştî ku dewleta Tirk a dagirker û çeteyên xwe Efrîn dagirkirin zilm û zordestiyê li ser gelê Efrînê bê navber berdewam dikin. Welatiyan direvînin û dikujin, malên wan talan dikin, destdirêjiyê dikin, cihên pîroz hildiweşînin û demografya herêmê diguherînin.***

Artêşa Tirk a dagirker welatiyên Efrînê neçar dike ku nasnameyên tirkî bigirin. Di heman demê de heman nasnemayan didin malbatên çeteyên ku li Efrînê hatine bicihkirin. Hate gotin ku armanca ji vê gavê ew e ku welatiyan tevlî hilbijartinên pêşwext ên Tirkiyê bikin. Artêşa Tirk a dagirker avahiyên kirine navendên xwe bi dîwarên bilind girtine. Her wiha Dibistana Şêx Mûs hilweşandine.

Li gor nûçeya di ajansa ANHA'yê de çavkaniyên herêmî diyar kirine ku Artêşa Tirk a dagirker welatiyên Efrînê neçar dikin ku nasnameyan werbigirin. Di heman demê de nasnameyan didin malbatên çeteyan ên ji Xûta û deverên din ên paytexta Sûriyê Şamê li Efrînê hatine bicihkirin, jî belav dike.

ANHA'yê wêneyê nasnameya ku Artêşa Tirk a dagirker amade kiriye parve kir. Tê gotin ku armanca ji dayîna wan nasnameyan ew e ku şêniyên herêmê û kesên li wir hatine bi cih kirin tevlî hilbijartinên pêşwext ên Tirkiyê bibin.


Hat diyar kirin ku Artêşa Tirk a dagirker noqteyên çavdêriyê bi lez datîne, her wiha nasnameyan li welatiyên herêmên Bakurê Sûriyê yên dagirkirine û parêzgeha Idlibê jî belav bike da ku wan beşdarî hilbijartinên 24'ê hizêranê bike.

### DIBISTAN RÛXANDIN

Ji aliyê din ve Artêşa Tirk û çeteyên wê dibistana Şehîd Hecî Mûs a seretayî ya herêma Raco ruxandin. Ev dibistana behsa mijarê ji kevintirîn dibistanên herêmê ye.

### WELATIYEK QETILKIRIN

Çavkaniyên herêmî ji Raco ragîhandin ku şêniyên navçeyê cenazeyê welatiyê bi navê Receb ê ji navçeyê di nava zeviyên çandiniyê de dîtin.Çavkaniyê ku ne xwest navê xwe eşkere bike da zanîn ku dema Receb ji kantona Şehbayê vedigeriya mala xwe ya li navçeya Raco, malbatek çeteyan di mala wî de bû, Dema Receb ji wan xwest ku ji xaniyê wî derkevin, çeteyan kurê wî yê biçûk revandin û ji jê xwestin ku ji xanî derkeve. Piştî kurê Receb berdan ew birin cihekî ne diyar.Heman çavkanî destnîşan kir ku di heman şevê de çeteyan welatiyê bi navê Receb Şukrî Reşîd kuştin û cenazeyê wî avêtin nava zeviyên çandiniyê ya li nêzî mala wî. Welatiyan cenazeyê Receb dîtin…***ANHA***


T.C.
İÇİŞLERİ BAKANLIĞI
HATAY VALİLİĞİ
GEÇİCİ KORUMA KİMLİK BELGESİ

| | |
|---|---|
| Yabancı Kimlik No / | 990[redacted] |
| Adı / | [redacted] |
| Soyadı / | [redacted] |
| Baba Adı / | [redacted] |
| Anne Adı / | [redacted] |
| Doğum Yeri / | SURIYE |
| Doğum Tarihi / | [redacted] |
| Medeni Durumu / | [redacted] |
| Aile No / | 12[redacted] |
| Uyruğu / | AFRIN / SURIYE |
| Kayıt Tarihi / | 18.04.2018 |

05.05.2018

## Şervanên QSD'ê gihiştin gundê Bakoz



Di qonaxa dawî ya Pêngava Bagera Cizîrê de şervanên QSD'ê gihiştin gundê Bakoz yê li ser ava çemê Firatê.

Pêngava Bagera Cizîrê ya li rojhilatê Dêra Zorê ku ji ber êrîşa dewleta Tirk a ji bo dagirkirina Efrînê sekinîbû û 1'ê Gulana 2018'an ji nû ve dest pê kiribû di roja 15'an de didome.

Şervanên QSD'ê derbasî gundê gundê Bakozê yê li rojhilatê çemê Firatê bûn. Gundê Bakozê xwedî girîngiyeke stratejîk e û rêya sereke ya gihandina navçeya Hecîn e ya ku baregeha dawî ya DAIŞ'ê li ser sînorê Sûriye-Iraqê û rojhilatê Firatê ye.

### CEBILXANE KET DESTÊN ŞERVANAN

Ji aliyê din ve opersyona paqijkirina gundên hatin rizgarkirin de, Şervanên QSD'ê miqdarek çek û cebilxaneyên çeteyên DAIŞ'ê desteser kirin.

Şervanên QSD'ê di çarçoveya opersyona li gundekî rojhilatê Çemê Firatê yên di çarçoveya pêngava duyemîn a Bager a Cizîrê de hate rizgarkirin, miqdarek çek û cebilxaneyên çeteyên DAIŞ'ê desteserkirin.

Çekên şervanên QSD'ê destserkirin ji topên hewanê, kilêş, ARK û miqdarek guleyên doçka, keleş û bombeyên destan pêk tên.

## HDP hêvî û baweriya gelan e



HDP danezana hilbijartina Serkomariyê û parlamenteriyê bi raya giştî re eşkere kir.

Di hilbijartina 24'ê Hezîranê ya zordest de Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) têkildarî hilbijartina serokomariyê û parlamenteriyê danezana xwe li Otela Hîltona a Enqereyê bi civînek berfireh bi raya giştî re eşkere kir.

Sloganên sereke yên rojeva civînê diyar dikin ên mîna "Tu dikarî", "Bi jinan wê bê guhertin", "Bi ciwanan wê bê guhertin", "Mirovekî Baş Demîrtaş", "Em li vir in dikarin" û "Dengek ji bo Demîrtaş û dengek ji bo HDP'ê" li salona civînê hatin daliqandin.

Hevserokên Giştî yên HDP'ê Pervîn Buldan û Sezaî Temellî, parlamenterên HDP'ê û rêveber û endamên HDP'ê tev li civînê bûn. Bernamzetên HDP'ê yên wekîliyê jî beşdarî civînê bûn.

Civîna eşkerekirina danezanê bi pêşandana sînevizyona ji dîmenên berê yên namzetê Serokomariyê yê HDP'ê Selaheddîn Demîrtaş pêk tên dest pê kir. Pişt re navê 11 wekîlên HDP'ê yên girtî û siyasetmedarên kurd ên girtî hat xwendin.

Hevseroka Giştî ya HDP'ê Pervîn Bûldan di civînê de axivî ya ku manîfestoya hilbijartinê ya HDP'ê lê hate eşkerekirin. Bûldan got , "Ji bo rizgariyê demeke kurt ma. Li bendê bin, em tên!"

### LI BENDÊ BIN EM TÊN

Manîfestoya hilbijartina 24'ê Hezîranê ya namzetê serokkomariyê Selaheddîn Demîrtaş li Enqereyê li Otela Hîltonê hate eşkerekirin.

Hevseroka Giştî ya HDP'ê Pervîn Bûldan di civînê de axivî û diyar kir ku ew ê teqez bi ser bikevin.

Bûldan di civînê de axivî û ev tişt got:

"Ji bo guherandinê, ji bo guherandina bi hev re, em tên. Ji bo jiyana wekhev û azad em tên. Em ji bo edaletê tên. Em nasname, bawerî û çanda vê axê ne. Em gelên berxwedêr in ên ku li ser axê ji bo rûmet û azadiya xwe li ber xwe didin.

Serokkomarekî rûken, dikare rûyê hemû welat bide kenandin. Dikare reşbînî û bêhêviyê biqedîne. Em dibêjin hindik ma, em ê rojên xweş bibînin. Li bendê bin, Demîrtaş tê. Li bendê bin HDP tê, ya ku maka hêvî û cesareta gelan e!

Di 7'ê Hezîranê de em bi ser ketin, em ê di 24'ê Hezîranê de jî bi ser bikevin

## Tirkiye komek çete ya nû ava dike



Ajansa Sputnik a Rûsyayê diyar ku Tirkiyê lîsteya kuştinan a çeteyên li herêmên di bin dagirkeriya wê de ne yên li Sûriyê diyar kirin da ku hêzeke nû li herêmê bi fermandariya "Feyleq El-Şam" ava bike ku yek ji tabûrên sereke ye ku êrîşî Efrînê kirine.

Ajansa Sputnik a Rûsyayê raporeke xwe di bin navê "istixbarata Tirkiyê lîsteyeke kuştinan a serçeteyan diyar kir." Her wiha destnîşan kir ku dagirkeriya Tirkiyê navekî nû li qonaxê dike da ku hesabên xwe li herêma Idlibê ya Sûriyê bi serçeteyên Heyet Tehrîr El-Şam (Cebhet El-Nusra) re bi dawî bike.

Ajansa Sputnik ku xwe dispêre çavkaniyên çapemenî yên nêzî çeteyên li Idlibê diyar dike ku rêzeteqînan di van du rojên dawî de li Idlibê pêk tên û destên istixbarata Tirkiyê di van teqînan de hene ku lîsteyek kuştinan ji navên serçeteyên Cebhet El-Nusra pêk tên ku siyasetên Tirkiyê qebûl nakin.

Li gorî van jêderan asta şerê teqînan bilind bûye beriya ku hêzeke leşkerî ya nû were avakirin ku gelek tabûrên çeteyan dê beşdarî nava wê bibin û di serî de "Feyleq El-Şam" û çeteyên "Cêş Idlib El-Hur" û çeteyên "Cêş El-Nesir" û çeteyên "Cêş El-Izze" û çeteyên "Hêza Beravê ya yekemîn" ku tê payîn di dawiya vê hefteyê de were ragihandin.

Tê gotin ku tevliheviya ewlehiyê li Idlibê rêbaza herî baş e da ku welatiyên Idlibê neçar bimînin ku bi hebûna hêzeke leşkerî ya nû razî bibin.

## Li Başûr û bakur 18 leşker û kontra hatin kuştin

HPG'ê diyar kir ku di çalakiyên gerîla de yên ji 9 heta 13'ê Gulanê, li Başûrê Kurdistanê 12, li Bakur jî yek jê kontra 5 dagirker hatine kuştin.


Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê li ser çalakiyên vê dawiyê yên gerîla daxuyaniyeke nivîskî weşand:

Di daxuyaniyê de hat gotin;

"Hêzên me di çarçoveya Pêngava Şoreşgerî ya Şehîd Pîroz û Şehîd Agirî de 12 û 13'ê Gulanê li dijî artêşa TC a dagirker çalakî kirin:

Di daxuyaniya HPG'ê de hat diyar kirin ku li Girê Sîro yê herêma Bermizê ya başûrê Kurdistanê leşkerek, li girê Lêlkanê du leşker, li tepê xwedê yê li herêma barzanê 9 leşker, li girê bayrak yê li herêma barzanê leşkerek di encama çalakiyê gerîla de hatin kuştin.

Her wiha HPG'ê ragihand ku li Çelê ya Colemergê ya bakurê Kurditanê çeteyekî xiyanetkar yê bi navê Kadir Aslan hat ceza kirin. HPG'ê diyar kir ku li Amed û Çewligê jî 3 leşker hatine kuştin.



## Cisir El-Şixûr bajarekî Tirkiyê tê hesbandin

Dewleta tirk herêma Cisr El Şixûr a Îdlibê wek eyaletekî xwe dibîne, her deverê dagir dike, nuqteyên çavdêriyê ava dike û bi vê yekê dixwaze demogarfiya herêmê biguhere û mîna eyaletekî xwe bihesibîne.

Kerwanekî leşkerî yê girêdayî artêşa Tirk a dagirker di riya korîdora Keferlosîn derbasî herêmên di bin dagirkeriya artêşa Tirk û çeteyên wê de ne, bûn. Karwanê leşkerî ji 150 tirmpêlên leşkerî pêk dihat. Li wê derê artêşa Tirk a dagirker hewil dide ku nuqteya herî dawî ya di bin navê çavdêriyê ya li Bakurê Sûriyê ava bike.

Dewleta Tirk nûqteyên xwe wê li gundewarên bakur ên parêzgeha Lazqiyê, Sehil El-Xab ê rojavayî Hemayê ava bike. Her wiha li gundewarên rojava yên Cisir EL-Şixûr ê bajarê Îdlibê di nava çend roja de wê ava dike.

Serokkomarê Tirkiyê Erdogan di civîna çapemenî ya ku li Balifirgeha Ataturk hate lidarxistin de diyar kir ku ew ê di nava du heftiyan de herdû nuqteyên xwe yên dawî ava bikin. Her wiha çavdêran destnîşan kirin ku Erdogan bi daxuyaniyên xwe dixwaze ku herêmên li Sûriyê bi temamî girêdayî Tirkiyê bike. Nuqteya herêma Cisir El-Şixûr li gorî nexşeyê ya herî nêze ji bajarê Îstebreq û Xana yê.





# Serkeftina çanda resen misoger e

***Endamê Rêveberiya Tevgera Çand û Hunerê li kampa Berxwedan Henan Sîdo diyar kir ku dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê li Efrînê êrîşî çanda Efrînê dikin û dixwazin qirikirina çandî pêk bînin. Sîdo got, "niha bi her awayî bişaftinê dimeşînin. Lê çanda kurd bi koke wê dijmin nikaribin bi ser bikevin.***



**Idrîs HENAN**

Bi êrîşên dagirker ên bi ser Efrînê de, Tevgera Çand û Hunerê li Kantona Efrînê bi çalakiyên cuda cuda demildest cihê xwe di sengerên berxwedanê de girt. Ji ber ku êrîş di binyada xwe de çandî û xwedî armanca pişaftin û helandinê bû, tevgera çandê bi ruhekî berpirsyar û li ser koka çandeke xwedî mîrateke berxwedêr li hemberî hewldana qirkirinê ya dewleta faşîst a Tirk li ber xwe da.

Henan Sîdo Endamê Rêveberiya Tevgera Çand û Hunerê li kampa Berxwedan têkoşîn, xebat, çalakî û çepera Tevgera Çand û Hunerê di duyemîn qonaxa Berxwedana Serdemê de ji rojnameya me re nirxand.

### ÇANDA RESEN WÊREKIYA GELÊ EFRÎNÊ YE

Sîdo rola Tevgera Çandê di yekemîn qonaxa Berxwedana Serdemê de bi bîr anî û ev tişt got: "Ji ber ku çanda me xwe dispêre mîrateke berxwedêr, bi destpêkê ve xwedî roleke pêşeng bû. Hemû qehremantiya şervanên azadiyê li sengerên berxwedanê weke çîrok, kilîp, şano û stran hatin vegotin. Ji bilî xebatên studyoyê hemû beşên tevgera Çand û Hunerê kom bi kom daketin kolanan û bi çalakiyên cuda beşdarî refên Berxwedana Serdemê bûn."

### ÇANDA BERXWEDANÊ SER DIKEVE

Henan Sîdo debêje ku di duyemîn qonaxa Berxwedana Serdemê de biryara girîng ew bû ku em li Şehbayê li derhola Efrînê ji nû ve tevgera xwe ya çandî bi rêxistin bikin û wiha dewam kir: "Em jî nola parçeyekî vê berxwedanê, bi gelê xwe re hatin Şehbayê. Me cihê xwe di nava gel de li kampên rûmet û berxwedanê girt. Tevî hemû zorî û zehmetiyan li Şehbayê jî Tevgera Çand û Hunerê endamên xwe komî ser hev kir û li gorî duyemîn merheleya Berxwedanê Serdemê ew bi rêxistin kirin. "Li gorî şert û mercên heyî em xebat û beşên xwe ji nû ve aktîv dikin. Armanca ew e ku gelê me li ser koka xwe berxwedana xwe bidomîne û li dijî hewldanên asîmîlekirinê bibe xwedî helwest. Em jî xwe di wê astê de erkdar û xwedî misyon dibînin." Sîdo got ku zarok herî zêde dibin mexdûrê êrîşên qirkirin û pişaftinê, ji ber vê pêwîst bû di serî de em zarokên xwe biparêzin û ev tişt li gotinên xwe zêde kir: "Ji bo ku em zarokên xwe ji bandor û armancên êrîşan biparêzên, bi taybet di herdu kampên Berxwedan û Serdem de me lez da xebatên xwe. Di herdu kampan de navên zarokan ji bo perwerdeyên cuda (stran, çîrok, govend, şano, nîgarkirin û hwd) hatin tomarkirin. Ji bo cihên dîtir jî me endamên xwe li derveyî kampan li ser esasê çar beşan (stran, govend, şando û sînama) jî birêxistin kirin. Ji bo perwerdeyê jî mamosteyên profesyonal û yên xwedî ezmûn hatine erkdarkirin. Wê girûpên perwerdeyê heftê carekê li hev bicivin û dersan li gorî beşan bibin."

### BÊÇANDÎ REWA NABE

Sîdo da zanîn ku armanca sereke ya êrîşên dagirkeriyê ji kokê qelandina gelê Kurd e, û got, "encax ev yek jî bi amûrên pişaftin û qirkirina çandî pêkan be. Dagirkeriya Tirk û çeteyên pê re di bingeha êrîşên xwe de çanda berxwedanê ya gelê kurd hedef digirt. Niha jî bi kiryarên xwe yên pişêfker (guherîna demografîk, nasnamedayîn, cilguhertin) dixwazin gelê kurd weke gelekî bê kok bide diyarkirin. Bi riya ajan û destekên xwe banga vegera bê rûmet li gelê me dikin. Armanca wan jî ew e ku van kiryarên xwe rewa bikin û gelekî bê helwest dûrî çanda xwe biafirînin. Ji bo vê yekê jî, hunermend û xebatkarên çandê yên li Efrînê mane û yên xwe bi kar tînin. Wan bi awayekî kirêt li dijî gel birêxistin dikin û derdixin ser ekranên xwe."

### AMÛRÊN ME PIR KÊM IN

Sîdo derbarê astengiyan de jî ev tişt got: "Bê guman; herêma Şehba ji ber kiryarên çeteyan derfetên jiyanê ji dest dabû. Li kêleka vê yekê teknîk û amûrên me pir kêm in. Ji bo vê jî hevalên me yên Çand û Hunerê li Kantona Cizîrê, di demeke nêz de soza destekdayînê dane. Endamê Tevgera Çand û Hunerê li kampa Şehba di dawiyê de tekez kir ku wê misoger çanda Kurdan a resen li hemberî êrîşên bê çandîtiyê bi ser bikeve. Çanda Kurdan xwedî zemîneke afrîner û bi kok e. Wê dagirkerî nikaribe li hemberî vê çanda resen li ber xwe bide. Serkeftina çanda resen misoger e."

## Jinên Kurd berxwedêr in



Derhênera fîlma 'Keçên Rojê' Eva Hûsson di Cannesa 71'emîn de axivî û got ,"Jinên Kurd berxwedêr in. Qet teslîm nabin û xurt in."

Di festîvala fîlman a navneteweyî ya Cannesê de ji bo xelata 'Palmiyeya Zêrîn' fîlma bi navê 'Keçên Rojê' ya li ser jinên Kurd e, têra xwe bi îddîa ye. Fîlma ku Eva Hûsson derhêneriya wê kiriye, di salonên cihê yên festîvalê de tê nîşandan.

Dema ku galaya fîlm dihate kirin lîstikvanên jin ên fîlm slogana 'Jin, jiyan, azadî' berz kirin û di daxuyaniya çapemeniyê de jî qala têkoşîna jinên Kurd û berxwedana wan hate kirin.

### MALBATA MIN JÎ LI HEMBERÎ FAŞÎZMÊ ŞER DIKIR

Derhêner Eva Hûsson, lîstikvan Gulşîfteh Farahanî, Emmanûela Bercot, Zubeyde Bûlût û çêker Dîdar Domehrî tevlî civîna çapemeniyê ya li Cannesê bûn. Eva Hûsson têkildarî çêkirina fîlm got, "Du sedem hene ku, me ev fîlm çêkir. Yek jê malbatî ye, ya din jî bandora jinên Kurd e. Ez neviya leşkerî komarparêz im ê ku li dijî faşîzma Franco têkoşiyaye. Di malbata min de kevneşopiyeke wisa heye. Sedema din jî bandora jinên Kurd a li ser min e."

### SERFIRAZIYA JINÊN KURD

Derhêner Hûsson di axaftina xwe de qala berxwedana jinên Kurd kir û got, "Ligel zilma DAÎŞ'ê ya li ser jinên Kurd, têkoşîn û berxwedana jinên Kurd bandor li min kir. Ew tu carî teslîm nebûn, bi berxwedana xwe bandor li min kirin. Azweriya wan a têkoşînê zêde ye, tekane hedefa wan serfirazî ye. Vî tiştî bandor li min kir. Bi vî fîlmê min xwest têkoşîn û serfiraziya jinên Kurd ragihînim cîhanê. Berxwedana jinên Kurd nayê dîtin. Ji ber vê jî min xwest vê berxwedanê di sînemayê de bi cih bikim."…***ANF***

## Karê destan bazinê zêr e



Jina ji pêkhateya turkmen Fatma Mihemed pispora rêsandina karê destan e. Bi hunera destên xwe malbata xwe xwedî dike û pêdiviyên hemû zarokên xwe pêk tîne. Fatma dibêje ku karê destan wekî bazinê zêr e.

Fatma Mihemed (60) a ji pêkhatiya Turkmen dayîka 6 zarokan e. Ji bajarê Serêkaniyê ye. 8 sal berê piştî hevjînê wê diçe ser dilovaniya xwe, dest bi karê çêkirina cilan bi desta dike û bi wî karî debara xwe û malbata xwe pêk tîne.

Fatma nêrînên xwe yên derbarê keda xwe de wiha tîne ziman: "Ez vê hunera destan ji zarokatî ji xaltîka xwe fêr bûm. Xaltika min ji ber ku qiymeta keda destan digirt xwest ez jî fêr bibim. Min bi kelecanek mezin ev karê hunerê pêk anî û fêr bûm. Dema ez zarok bûm min li ber ronahiya çirayê karê xwe dikir. Di şert û mercên dijwar de min dev ji hunera xwe berneda. Min cil û bergên xweşik bi destê xwe dirêsa."

Fatima Mihemed dayîka 5 keç û kurekî ye, bi hunera xwe ya karê destan re mijûl dibe û wiha pêdivyên zarokên xwe pêk tîn e. Di demsala zivistanê de karê Fatma zêde dibe. Fatma derbarê karê xwe de ev tişt anî ziman: "Cilên li bazarê pir buha ne, ji ber vê yekê gelek mirov ji min dixwaz in ez ji bo wan cil birîsim. Gelek hevalên min rîs ji min re tînin. Ez jî ji wan re cilan û pêdiyên din çêdikim, ez jî rewşa xirab a aborî didim ber çavan, lewma bi erzanî kar dikim û pereyan pir ji wan nagir im. Bi vî karê xwe ez gelek pêdiviyên civakê pêk tîn im."

Fatma Mihemed da zanîn ku hunera wê ya karê destan wekî zêre û got: " Karê destan wekî bazinê zêr e. Ew cilan, dora desmalan ji morîkan, kum, şal, çekên zarokan, gore û lepikan bi tayên rengîn çêdikim."…***ANHA***

## Li rojava zimanê kurdî pêş dikeve

**Rizgar HEBEŞ**

Bi boneya Cejna Zimanê Kurdî di 15'ê Gulanê de rêveberiya Komîteya Perwerdeya Civaka Demoqratîk rewşa perwerdeyê û di saya şoreşa Rojavayê Kurdistanê çêbûne nirxandinên girîng kirin.

Bi boneya Cejna Zimanê Kurdî di 15'ê Gulanê de rêveberiya Komîteya Perwerdeya Civaka Demoqratîk nirxandinên girîng kir û diyar kir asta perwerdeyê ket qonaxên nû û ew hertim di pêvajoya pêşketinê de ne.

Endama Rêveberiya Giştî ya Komîteya Perwerdeyê Şêrîn Hîmo diyar kir di van çend salên şoreşê de perwerde ji asta tenê zimanê kurdî derket, ket qonaxeke nû û wiha got, "metiryal bi giştî hat guhertin û perwerde bû bi giştî. Ji ber rêjîma Baas perwerde bi awayekî nijadperest dida meşandin û her tiştek ne erebî buya qedexe bû. Sîstema perwerdeyê niha bi zimanê dayikê ye. Kurd, Ereb û Siryan herkes bi zimanê xwe dixwîne û fêrî zimanên din jî dibe.".

Derbarê mijara îtîrafê de Şêrîn Hîmo wiha destnîşan kir: "Dewletê ev zihniyet di civakê de çand ku îtîraf xistibû di hundir kartonekê de. Ew bawernameya pê muteref dida xwendekar û dikir karmendê xwe û ji civakê qut dikir. Di sîstema KPCD'yê de ya ku li ser bingeha fikir û felsefeya Netewa Demoqretîk ava bûye civak bingeh e. Mamosteyên ziman cihê xwe di komînan de digirin ji ber ku erkê sereke yê mamosteyan perwerdekirina civakê ye. Ji xwe gelek şande ji dewletên Ewropî hatin Rojava gavên ku di derbarê perwerdeyê de li Rojava-Bakûrê Sûriyê hatine avêtin pêşketî dîtin.

Ji bo derbarê projeyên dema pêş de Endama Rêveberiya Giştî ya Komîteya Perwerdeyê Şêrîn Hîmo wiha got, "Pêşxistina Bexçê Zarokan ku di demên pêş de li her bajar û gundekî bexçeyeke zarokan hebe ji ber ku bexçê zarokan û xwendina seretayî bingeh e. Ya 2'mîn ew e ku xwendina bi zimanê dayikê di sala bê de wê heya refa 11'an be ji ber wê perwerdeya branjan ê bên dayîn.



# Li Xezzayê şer: 37 kes mirin

***Beriya vekirina Balyozxaneya DYA'yê ya li Qudûsê li Xezzayê bi deh hezaran Fîlîstiniyan xwestin çalakiyên protestoyê li dar bixin. Leşkerên Îsraîlê li ser xeta sînor a Xezzayê gule li xwepêşanderan barandin. Hate diyarkirin ku bi kêmanî 37 Fîlîstînî mirine û bi kêmanî 900 kes jî birîndar bûne.***

Leşkerên Îsraîlê li ser xeta sînor a Xezzayê gule li xwepêşanderan barandin. Hate diyarkirin ku bi kêmanî 37 Fîlîstînî mirine.
Beriya vekirina Balyozxaneya DYA'yê ya li Qudûsê li Xeta Xezzayê bi deh hezaran Fîlîstiniyan xwestin çalakiyên protestoyê li dar bixin. Li gorî hin agahiyên ji herêmê bi kêmanî 40 hezar Fîlîstînî tevlî çalakiyê bûne.
Dema ku kom nêzî bariyerên ewlehiyê bûne, gule li xwepêşanderan hatiye reşandin.
Li gorî rayedarên Xezzayê bi kêmanî 37 kes mirine.
Rayedarên tendirustiyê yên Fîlîstînê ragihandin ku bi kêmanî 900 kes birîndar bûne û 450 kes gule li wan ketine.
Berdevkê hikumeta Fîlîstînê Yûsûf El Mûhammed diyar kir ku hêzên Îsraîlê qetlîam kiriye û bang li civaka navneteweyî kir ku bila vê hovîtiyê bidin sekinandin.



## Li Endonezyayê êrîş pêk hat



Li Endonezyayê, çar xwekujên bombeyî êrîş birin ser qereqoleke polîsan.
Êrîş li qeerqola Sûrabaya hate kirin. Rayedaran gotin, herî kêm polîsek miriye, 10 kes jî birîndar bûne. Hate ragihandin ku her çar êrîşkar hatine kuştin.
Berdevkê Polîsên Eyaleta Cava ya Rojhilat Frans Barûng Mangera got, "Çar êrîşkarên li ser du motorsîkletan bûn mirin. Niha lêkolîn li ser nasnameya wan tê kirin. Keçeke 8 salî ya bi wan re bû, sax e."
Serokkomarê Endonezyayê Joko Wîdodo êrîş mehkûm kir û got, "Çalakiyeke namerdî, bê rûmet û li dijî mirovahiyê ye. Di têkoşîna dijî terorîzmê de, li ser tedbîrên tên girtin wê ti guhertin neyên kirin."


## Îran mîsogeriyê dixwaze

Wezîrê Karên Derve yê Îranê Mûhammed Zarîf diyar kir ku piştî vekişandina DYA'yê ew ji îmzevanên peymana nukleer mîsogeriyê dixwazin.

Zarîf diyar kir ku di tûra Pekîn, Moskova û Brukselê de ew ê mîsogeriyan bixwazin ên ku 'berjewendiya Tehranê tê parastin."
Wezîrê Karên Derve got, "Tekane hedefa van muzakereyan ew e ku bi van peymanan re mîsogerî werin bidestxistin ên ku berjewendiya gelê Îranê lê tê parastin."
Zarîf ev daxuyanî di serdana Moskovayê de kir. Wezîrê Karê Derve yê Rûsyayê Sergey Lavrov jî diyar kir ku divê Rûsya û Ewrûpa di vê dosyeyê de berjewendiyên xwe biparêzin.
Li gorî daxuyaniya li ser malpera Parlementoya Ewrûpayê, welatên Ewrûpayê ji bo meseleya peymana nukleerê karibin mîsogeriyê bidin Îranê 60 rojên wan hene.



## Li dijî zayendperestiyê çalakiya rûpoşa çêlekê



Li Hindistanê li dijî zêdebûna êrîşên zayendî ku di demên dawî de zêdetir bûne çalakiyên jinan berdewam dikin. Hefteya bihurî piştî ku du zarokên keç rû bi rûyî êrîşan hatibûn hiştin û piştre jî bi îşkenceyê hatibûn Kuştin çalakiyên ku hatin destpêkirin berdewam dikin.
Li welatê ku ji ber baweriya olî çêlek pîroz tên dîtin û tên parastin wênesaz Sujatro Gosh, di çalakiyek da destpêkirin jinan jî rûpoşa çêlekê bi kar anî û êrîşên li dijî wan tên kirin şermezar kirin.
Di wêneyê ku ji aliyê Suatro Gosh ve hat xêzkirin de, jin bi kincên herêmî û moderen xuya dikin. Jinên ku rûyê xwe bi rûpoşa çêlekê girtin, êrîşên hovane ku li dijî wan tên kirin şermezar dikin.
Herwiha li welatê ku her sal bi deh hezaran jin bi êrîşa zayendî re rûbirû dimînin di sala 2016'an de 40 hezar bûyerên êrîşa zayendî derbasî qeydan hatine kirin. Lê tê diyarkirin ku hejmara rastî ji vê zêdetir e.

## Li Parîsê 2 kesên din hatin destgîrkirin



Ji ber êrîşa roja Şemiyê ya li Parîsê ku kesekî jiyana xwe ji dest dabû, li bajarê Strasbourgê du kesên din bi sedema ku pêwendiya xwe bi êrîşkar re hebû hatin destgîrkirin.
Roja Şemiyê kesek bi kêrê ketibû stasyona metro ya Quatre-Sembre ya Parîsê û kesek kuştibû gelek kes jî birîndar kiribû. Piştî êrîşê, dozgeriya Parîsê mijar radestî yekîneya antî-terorê kiribû.
Hatibû eşkerekirin ku êrîşkarê bi destwerdana polîsan hate kuştin, welatiyekî Fransayê yê ji Çeçenîstanê ye. Derket holê ku êrîşkarê bi navê Khamzat Azîmov tevî malbata xwe serlêdana penaberiyê li Fransayê kiribû û li bajarê Strasbourgê sala 2010'an mafê welatîbûna Fransayê bi dest xistibû.
Tê gotin ku pêwendiya êrîşkar bi çeteyên DAÎŞ'ê re hebû û sala 2015'an dibe ku bi komeke dixwest endaman ji çeteyan re peyda bike, têkiliya xwe hebû.
Polîsên ku dê û bavê êrîşkar destgîr kirin, duh êvarê jî li Strasbourgê hin hevalên êrîşkar destgîr kirin. Hate ragihandin ku li ser kesekî bi rengekî rûgirtî hate destgîrkirin, tîşortekî bi nivîsa "Grozny" û wêneyê kalaşnîkovê hebû.

## M5 û Lîga Bakur wê bibin hikumet

Li Îtalyayê li ser hevdîtinên hikumeta koalîsyonê hevdîtin dihatin kirin. Di dawiyê de li hev hate kirin ku tevgera M5 a 'dijberê sîstemê' û Lîga Bakur a nîjadperest hikumetê ava bikin. Hate ragihandin ku di encama hevdîtinên navbera lîderê Tevgera 5 Stêrk (M5) Luigi Di Maio û lîderê Lîga Bakur a rastgiriya tund (Lega Nord) Matteo Salvini de li ser hikumeta koalîsyonê li hev hatiye kirin.
Li gorî nûçeya ajansa nûçeyan a AGI, detayên li ser lihevkirina Di Maio û Salvini wê bên eşkerekirin. Wekî din wê bê ragihandin bê serokwezîrê hikumeta koalîsyonê kî be. Dema ku ev kes ji aliyê Serokkomar ve hate erêkirin wê dest bi wezîfeya serokwezaretiyê bike.
Li Îtalyayê di hilbijartina 4'ê Adarê de Lîga Bakur (Lega Nor) û tifaqa rast-rastgiriya tund a Forza Italia û Fratelli d'Italya 37 ji sedî yê dengan girtibûn. Tevgera 5 Stêrk (M5) ku partiya 'li dijî sîstemê ye' bi tena serê xwe tevlî hilbijartinê bûbû û 32,7 ji sedî yê dengan standibû. Bi vî rengî di nava partiyan de bûbû partiya yekemîn.
Partiya Demokrat a Serokwezîrê berê Matteo Renzi jî di nava tifaqekê de tevlî hilbijartinê bû. Tifaqê 22,9 ji sedî yê dengan girtibû. Ji ber vê têkçûnê Renzi neçar mabû ku ji wezîfeya sekreteriya giştî ya partiyê îstifa bike.

## ELN çalakiyên xwe yên leşkerî disekinîne



ELN a ku li Kolombiyayê tevgera gerîlayan e diyar kir ku beriya hilbijartinên 27'ê Gulanê ew ê 'çalakiyên xwe yên leşkerî' bide sekinandin.
Artêşa Rizgariyê ya Neteweyî (ELN) li ser twîtterê daxuyanî da û got, "ELN ji 25'ê Gulanê heta 29'ê Gulanê ji bo avakirina şertên guncav ên hilbijartinê, ew ê çalakiyên xwe yên leşkerî bide sekinandin."
Li Kolombiyayê ew ê tûra pêşîn a hilbijartina serokkomariyê di 27'ê Gulanê de were kirin.
ELN diyar kir ku 'bi hêviya ku hikumet jî bersiveke wisa bide vê gava me.'
Nêzî 1.500 şervanên ELN hene. Diyaloga di navbera ELN û hikumetê hefteya borî li Havanayê hate destpêkirin a ku paytexta Kubayê ye.
Serokkomarê Kolombiyayê Jûan Manûel Santos diyar kir ku heta peywira wî ya heta meha Tebaxê bi dawî nebe, ew ê aştiyeke teqez bi ELN'ê re pêk neyê. Santos diyar kir ku heke mûxalefeta rastgir a ku li dijî muzakereyên bi gerîlayan e di hilbijartinê de bi ser bikeve, ew ê ji ber bidawîbûna hewldana aştiyê bi fikar be.

## Şehîdên meha Gulanê hatin bibîranîn



Li bajarê Strasboûrgê yê Fransayê ji bo bibîranîna şehîdên meha Gulanê çalakiyek hate lidarxistin.
Çalakiya bibîranînê li Navenda Civakî ya Kurd a Demokratîk a Strasboûrgê hate lidarxistin. Li ser navê Saziya Malbatên Şehîdan a Ewrûpayê Dayîka Şengê, Endamên Înîsiyatîfa Jinan a Zînê û malbatên şehîdan ên li Strasboûrgê axivîn. Axaftvanan diyar kirin ku ew ê armanca şehîdên bi cih bînin.



# Divê Kongreya Netewî bê lidarxistin

***Hevseroka Desteya Rêveber a TEV-DEM'ê Asya Ebdulah diyar kir ku divê gelê kurd li dijî hevkariyên hêzên dijber ku îro li dijî gelê kurd gihiştine hev, yekîtiya xwe ava bikin. Ebdullah wiha got, "Ji bo pêşî li êrîşên li dijî kurdan were girtin, divê hemû hêzên niştimanî yên Kurdistanê piştgiriya Kongreya Netewî ya Kurdistanê bikin."***

Hevseroka Desteya Rêveber a TEV-DEM'ê Asya Ebdulah diyar kir ku divê gelê kurd li dijî hevkariyên hêzên dijber ku di dîrokê de tu carî nebûne yek û îro li dijî gelê kurd gihiştine hev, yekîtiya xwe saz bikin û ev tişt anî ziman: "Ev nêzîkatiyên wan asta girîngî û bi bandor a doza gelê me nîşan dide. Ji bo rê li ber binpêkirinên wan were girtin, divê hemû hêzên niştimanî yên Kurdistanê bi rihê berpirsiyariyê ya bilind piştgiriya Kongreya Netewî ya Kurdistanê bike.
Gotarek Hevseroka Desteya Rêveber a TEV-DEM'ê Asya Ebdulah li ser rojnameya Bûyer a bi sernavê "Kongreya Netewî ya Kurdistanê û pêwîstiya lidarxistina wê di rewşa veguhertinê ya herêmê de" hate weşandin.
Gotara Asya Ebdulah wihaye: "Encamê Cenga Cîhanê ya Yekem bû sedema ku gelek hevgirtin û yekîtî werin hilweşam din. her wiha hêzên nû derketin û di hin hêzan de parçebûn pêk hat. Gelê kurd ji mafê xwe bê par ma. Di Cenga Cîhanê ya duyemîn de jî binpêkirin û inkar li dijî gelê kurd hate meşandin, ev rewş di Şerê Sar de jî dewam kir. Ema di dema niha de diyar dibe ku gelek tişt ji gelek aliyan ve têne guhertin. Diyar dibe ku pirojeyek nû li herêmê heye, bi riya vê pirojeyê dê rewşa herêmê ya nû were diyarkirin. Bi van guhertin û pêşketinên diramatîkî re ku di herêmê têne jiyankirin, pêwîstî bi domandina şoreşê û berizkirina asta berxwedanê heye. Rizgarkirina Efrînê wê misogeriya mayîna me di aliyê bibandor de bihêle. Wiha jî wê zehmet be tu alî biryara me bigrên me û pirojeyên me yên civakî ku ev 7 sal in em ji bo wê tekoşîn dikin asteng bikin. Ev cihê me yê bi hêz, piştiriya hemû keda me ku dikare dibe bingeha hevgirtina me ya bi hêza saz bike dike. Wiha jî wê hêzên dijber ku hîn ji bo têkbirina gelê me kar dike neçar bibin paş de veger in. Ji ber wê xwe li ber xwedananek mezin bibîn in.
Doza kurd di Rojhilata Navîn de pir girîng e û êşa bi milyonan insan nîşan dide. Çareseriya ku dê aramiyê bi xwe re bîne, divê bi çareserkirina dozên gelan ve girêdayî be. Ji wan jî gelê kurd e. Ev çareserî bê guman dê bandora wê li ser veguhestina di herêmê de pêk tê hebe. Bi taybet jî di dawîkirina aloziyên ku ji ber kiryarên hêzên hegemon ên îradeya gelan dîlgirtine , wê bi bandor be.
Girîngiya Doza kurdî û bandora wê ya li herêmê pêwîst dike ku rewşeke hevgirtina niştmanî ya kurd hebe. Yekîtiya xwe ya bi hêz di biryardayînê de ava bike, da ku ber bi girîngiya doza kurd ve here. Ev rewş di çarçoveya yekîtiya gelê kurd de dê pêk were. Diyar e pêwstîtî û daxwazeke vê rewşê ya ji bo derxistina helwesteke kurdî ya bi hêz e heye. Wiha jî wê rê li ber hewldanên ku bandoreke neyînî li ser bike, were girtin.



Kongreya Netewî ya Kurdistanê helwesteke yekbûyî misoger dike. Istratejiyeke li gorî guhertinên giştî û taybet ên pêk tên, datîne. Ev gav dê bibe riyeke bi hêza a xelaskirin û rizgarkirina doza kurd.
Tiştê îro li Rojavayê Kurdistanê pêk tê, avakirina pirojeya ku dê hemû pîlanên hêzên dijberê gelê kurd vala derbixe ye. Pîlanên ku li dijî gelê kurd pêk tên û rê li ber pêşketina kurdan digre dê vala werin derxistin. Şoreşa niha bi berxwedan û tekoşîna xwe teror şikand. Paşê jî li Efrînê li dijî hemû hêza dewleta Tirk û çeteyên wê derket. Vê berxwedanê rastiyên bingehîn saz kirin. Rastiya veguhertina ber bi demokrasiyê ya li Sûriyê û azadiya jinê ku îro bûye yek ji hêmanên bingehîn ên şoreşê ye. Ev hemû gavên hatin avêtin ber bi avakirina helwestekê ve dişîne. Ev helwest divê bi hêz be. Ji ber qonaxa li pêşiya me wê bibe qonaxa bilindkirina asta şer di hemû astên xwe de. Bi taybet di vê dema pîlanên hatine amadekirin têk diçin.
Ji bo gelê kurd li dijî hevkariyên mezin ên tu carî di nava dîrokê de nighane hev, dimîne. Tenê niha ji bo bajar û meydanên me bikin qadên şer, ev nêzîkatiyên wan pêk hatine. Ev nêzîkatiyên wan asta girîngî û bibandor a doza gelê me nîşan dide. Ji van pêwîstiyan û ji bo rê li ber binpêkirinên wan were girtin, divê hemû hêzên niştimanî yên Kurdistanê bi rihê berpirsyartiyê ya bilind têbikoşe û piştgiriya Kongreya Netewî ya Kurdistanê bike. Ev gav dê riyên nû li herêmê vebike û pêşketinên girîng bi şoreşa Berxwedanê, şoreşa jinê û şoreşa Demokratîk a Rojava re bîne. Dê bibe pingeha rakirina kiriyarên berê yên neyînî ku li dijî gelê me hatine ferizkirin. Lê belê ev ji tevahiya gelên herêmê yên qebûl nekirin ji biryarên wan teslîm bibin, derbasdar e. "

## tekoşîna mamosteyên jin êrîş vala derxistin

**Melek DEMÎRTAŞ**

Têkildarî rewşa perweredeya zimanê kurdî rêvebirên KPCD'ê di salvegera cejna zimanê kurdî de agahî û nirxandin kirin.
Endama Kordînasiyona xweser a KPCD'ê li Kantona Qamişlo Gulnaz Ehmed diyarkir ku rêjeya mamosteyên jin îsal gihaye sedî 98, her wiha bi riya komîteyên ku hatine avkirin gelek meteryalên nû hatine afirandin û got :" êrîşên ser zimanê kurdî bi tekoşîna mamosteyên jin vala derketin"
Gulnaz Ehmed rola mamosteyên jin vegot û dazanîn ku ya herî zêde ji bo perwedekirina zarokan xwedî derdikeve û berpirsiyar dibîne jin e û wiha got: " îsal ya herî zêde peywira perwerdeya zimanê kurdî li xwe girt jin bû, bi qas sedî 98 mamosteyên Kurdî jin in, gelemperiya van mamosteyan jî bi dildarî ev sê salin dixebitin".
Gulnaz bal kişand êrîşên li ser ziman tên kirin û ev yek anî ziman " ji sala 2015'an de piştî ku saziya me ji TZP'ê bû KPCD'ê gelek hewldanên reşkirinê hatine kirin. Li ser meteryalên ku dihatin amedekirin mîna jinelojî û hin din yên felsefî û wêjeyî, taybetî di nav de ya kurdî êrîş mezin bûn; lê bi tekoşîna mamosteyan ev êrîş vala hatin derxistin.
Gulnaz Ehmed di dirêjahiya axaftina xwe de rola mamosteyan di komînan de jî nirxand û got " gelek mamoste cihê di nava komînan digirin. Ew mamoste bi komîteya malbatên şagirtan re her di nava têkiliyên di derbarê rewşa wan de ne. Lewra bi riya komîn û komîteya malbatan re rewşa şagiratan tê zanîn, di dawiya salê de jî ev komîte çalakî û pêşengehên cur be cur ji zarokan re li dar dixe".
Endama Kordînasiyoan KPCD'ê li Kantona Qamişlo Gulnaz Ehmed di dawiya axaftina diyar kir ku ew amedekariyên lidarxistina konfersên xwe yên li herêmên nû rizgarkirî dikin, her wiha ji bo sala pêş wê heya refa 11'an perwedeya branşan vekin".





## Salvegera rizgarkirinê pîrozkirin

Şêniyên mezraya Reşîd a girêdayî bajarê Reqayê salvegera rizgarkirina herêmê ji çeteyên DAIŞ'ê pîroz kirin.
Şervanên QSD'ê 16'ê Gulana sala 2017'an di çarçoveya Operasyona Xezeba Firatê de, mezraya Reşîd rizgar kirin. Şêniyên herêmê li hev civiyan û salvegera rizgarkirinê pîroz kirin.
Di civînê de bi sedan welatiyên herêmê, rûspiyên êlên Reqayê, Hevserokê Komîteya Têkîliyên Leşkerî yên giştî şêx Ayid Berekat û şervanên QSD'ê amade bûn.
Civîn bi rêzgirtinê dest pê kir. Piştre Fermandarê QSD'ê Çiya Zagros, Hevseroka Meclîsa mezraya Reşîd, Nesrîn Mihemed, Endama Mala Jinê Fatma Hisên, Endamê Komîteya Têkîliyên Leşkerî Şêx Ayid Berekat û bi navê Meclîsa Sporê ya Reqayê Mûsa Mihemed amade bûn.
Kesên ku axivîn salvegera rizgarkirina mezraya Reşîd pîroz kirin û da zanîn ku bi saya berxwedana QSD'ê gelê Reqayê ji dîktatoriyê azad bûn. Her wiha bang li gelê Reqayê kirin ku li hember êrîşên çeteyan yekîtiya xwe xurt bikin…*ANHA*






## Faşîzma ji faşîzmê wêdetir

**Medeni FERHO**

Li Tirkiyê faşîzm heye? Erê heye!..
Li Tirkiyê hilbijartin çêdibin? Erê çêdibin!..
Hilbijartin ji bo parlamenter û serokkomar e? Erê!...
Navê sîstemê komar e-cemawerî ye? Erê!
Ev teva, bi normên demokrasiya parlamenterîzmê ne û her kes mutabiq e ku li Tirkiyê faşîzm heye. Gelo faşîzma li Tirkiyê "kedî" kirî ye? Gelo faşîzma Hîtler, Franco, yan jî ya Saddam "berrî" bûn? Eger faşîzm, zaroka kapîtalîzmê be, dagirkerî di ruhê kapîtalîzmê de heye. Yanî kapîtalzîm, bêyî faşîzmê nikare xwe xwedî bike. Yanî, kapîtalîzm demokrasî dike şûrê demokles. Pêdiviya kapîtalîzmê bi faşîzmê, ya faşîzmê jî bi demokrasiya (!) spî heye. Bêdengiya Ewropa, ya li hemberî barbariya Erdogan vê dibêje.
Ji bo faşîzma Erdogan û Bahçelî, Kurdistan bûye xasbahçeyên Îraz û şadirwanên Badayê... Kurdistan, Bakur, Rojava û Başûr, di himbêza faşîzma "rabîa" de ne. Em faşîzma Erdogan-Bahçelî, bi gotina Birêz Ocalan "faşîzma kesk" bi nav dikin. Berî faşîzma kesk, faşîzma spî hebû. Faşîzm, di rojekê de, di salekê de nayê rêxisinîkirin û avakirin. Binyata faşîzma Tirkî-Îslam, 107 salî ye. Di Kongreya Îttîhadiyan li Selanîkê, (1911) hate formulekirin. Di sed salî de Rum, Ermenî, Suryanî-Keldanî, Kurd, civakên Elewî, Êzîdî qirkirin.
Ev sedsal, destpêka oryantalîzma ku Ewropa daye dest pê kirin e. Destpêka netewe-dewletan e û zanist kirin xizmeta rastmal. "Kûnêra xedarhabîs ur" e û armanc talankirin e. Talankirin jî bêyî faşîzmê nabe.
Faşîzma Îttîhadiyan, mînaka wê Erdogan e û dagirkeriyê tenê di aliyê bazirganî de nake... Di aliyê cografîk, kultur, dîrok, psîkolojîk û sosyolojîk de dikin. Înkar û tunekirin!.. Faşîzma Hîtler wek zaroka faşîzma Îttîhadiyan tê binavkirin, ya Erdogan jî, wek çêlîkê faşîzma Ewren tê binavkirin.
Faşîzma Îttîhadiyan taybet e; ji bo ku vijdanê xwe aram bikin,(!) tune dikin; kulturê tune dikin, ziman qedexe dikin, dîrokê,demografiyê diguherin. Di van karan de pispor in, endesyariyek balkêş dikin. Ev sîstema dewşirmetiya bê binyat, pîç e.
Sîstema kapîtalîst, dîse bi gotina Birêz Ocalan "dînazor e" û dixwaze tevahiya cîhanê bike nava pençeyên xwe. Gelek caran faşîzma ku hatiye xwedî kirin, li serê kapîtalîstan bûye bela. Saddam mînak e!.. Îro jî Erdogan di wê riyê de ye.
Li Tirkiyê rewşa awarte heye û hilbijartin wê çêbibin. OHAL, ji aliyê Erdogan ve, wek darbeyek di nava derbeyan de hate ilan kirin; hilbijartin jî wek darbeyekê û piştî dagirkirina Efrînê kire pratîkê. Dagirkirina Başûrê Kurdistanê jî, bi heman behaneyê dan dest pê kirin. Lê xuya dike ku, dagirkirina Başûr, li Lelikan û Bradost, wek ku Erdogan dixwaze naçe serî. Zêde tabut bi ser de diçin.
Erdogan, wek "fatihê" Efrînê li pêşberî komên xelkê diaxive. Lê hal-î perîşan-î melûl têkçûna wî nîşan dide. Têkoşîna Kurdan ya li dijî faşîzmê, ew perîşan-î melûl kiriye.
Kesayetên ketî, yên Kurd, li dora Erdogan bûne mertal... Kurd, totem û tabuyên faşîzma Erdogan têk dibin, ew kesayetên ketî jî, ji nû de ava dikin. Ji bo fêmkirina van zewatan, pêdivî bi nirxandinên fîlozofîk nîne; nirxandinek psîkolojîk û aborî bes e. Kesayetek şermûtî ye!
Faşîzma Îttîhadî, di kesayeta Erdogan de bi beden bûye û "Rabîa" slogana wî ye. Bi qirkirina Kurdan, dixwaze cografya Kurdistanê jî li netewa Tirk tapu bike.
Haraketa Azadiya Kurd, nêrîna li dîrokê guhertiye. Dîroka ku ji destpêka mirovahiyê, heta dawiya cîhanê, wek çemê jiyanê berdewamî ye, êdî wek berê nayê nirxandin. Sosyolojiya tevahiya Rojhilata Navîn û dîrok hatiye "keşif" kirin. Zihniyeta cîhanê jî hinekî hatiye guhertin. Hilbijartinên 24ê Hezîranê wê li Tirkiyê û Bakurê Kurdistanê rewşek nû derbixe holê. Me got, dagirkirina Efrînê wê gelek guhertinan bi xwer bîne.



## Li hember roma reş weke îsewiyan berxwedan

Qasim ENGÎN

Di dîrokê de berxwedana Îsewiyan li hember rejîma koledar û hov, Roma Reş nav û deng e. Lepek Îsewî tevî ewqasî erîşên; hovana, çarmexkirin, kuştin, komkujî, mişextkirin û şewitandin, Roma Reş piştî salan şûn ve anîbûn ber linge xwe.
Çawa ku Roma Reş bê wijdan û bê hesab êrîş dibirin ser lepek bawermendên Îsewî, bi heman şêweyê bi rêbazên hovane dewleta dagirker a Tirk erîşan dibe ser kurdan. Komkujiyan, qirkirinan, mişextkirinan û veguherîna demografya pêk tîne. Li berçavên hemû cîhanê van kirinên xwe yên dij mirovî eşkere pêk tîne. Her wiha gefên xwe li ser kurdan û erdnîgariya wan kêm nake. Berovajî erîşên xwe her roja pêş ve diçe, him bi hêzên xwe yên çekdarî him jî bi çeteyên xwe yên DAÎŞ û El Qaîde firehtir dike.
Li hember dewleta wiha komkuj, qirker û dijminê gelê Kurd û gelan pêwîste çi were kirin?
Bêguman hewldanên ku bixwazin van pirsgirêkan bi rê û rêbazên aşîtî çareser bikin, bi wate ne. Lê mixabin dewleta tirk zimanê aşîtî û demokrasî ne dizane ne jî nas dike. Ev yek.
Rêya dûyemîn ji dewleta qirker re teslîm bûyîne. Vîna xwe teslîm kirin e. Xwe radest kirin e. Ango dev ji mirovahiya xwe berdan e, ji mirov bûyînê derketin e. Lê em di dîroka dewleta qirker û mêtinger de jî dizanin ku, eger teqez teslîm bûyîn û ji xwe û ji rûmeta xwe dev jê berdan nebe, dewleta Osmanî tucaran teslîm bûyînek wiha qebûl nake. Berovajî, dewleta Osmaniyên faşîst tenê ji mirov bûyînê derketinê dipejirînin. Ev jî rêye kê, lê rêye kê bê rûmet û bê şeref e!
Rêyek din jî heye, ew jî rêya berxwedanê ye. Rêya ku bi tevahî hêzên xwe rêxistin bike û li hember Deccalên demê tekoşîn bike ye. Rêya ku xwe bike wijdanê demê û li hember faşîzmê bisekine ye.
Erê tam jî çawa ku di dema xwe de Îsewî li hember Roma Reş berxwedan, tam jî wek wan rêbazan, berxwedaniyek bê hempa pêşxistin e.
Em dizanin ku Îsewî li hember bê wijdaniya Roma Reş tam 300 salî berxwedan e û di dawî de jî Roma Reş anîne ser xeta xwe. Heta wiha kirin ku Roma Reş neçar ma ku baweriya Îsewiyan him bipejirîne û him jî baweriya Îsewiyan bibû ola fermî ya Roma Reş.
Di roja me ya îroyîn de rêbaza Îsewiyan a berxwedanî li hember Roma Reş, Şerê Gel yê Şoreşgerî ye. Şerê Gelê Şerker e. Bi gotinek din, bi tevahî hêza xwe li hember faşîzma dagirker a Tirk sekinandin e.
Bi tevahî hêza xwe li hember faşîzma dagirker a Tirk sekinandin, ne tekoşînek bi rêzêye. Dema ku em dibêjin bi rê û rêbaza Îsewiyan mabesta me ew e ku, her bajarek, her bajarokek, her taxek, her gundek, her malek, her malbetek, bi gotinek din her kesek li hember faşîzma dewleta tirk a faşîst û mêtinger xwe bike keleheyek. Ango xwe wek keleheyekê rêxistin bike.
Erê, dem tam jî dema ku em xwe wek Îsewiyên demê li hember Roma Reş berxwebidin û têkoşînê bikin.
Him jî li seranserê Kurdistan!

# PKK bûye hêviya gelan

***Cemîl Bayik diyar kir ku hemû kesên azadî û demokrasiyê dixwazin û armanca wan serketina sosyalîzmê ye paradîgmaya rêber Apo esas digirin. Ji bo wê jî tevgera me her ku diçe mezin û fireh dibe. Êdî ji çarçoveya Kurdistan û Rojhilata Navîn derketiye û di asta cîhanê de têdikoşe.***



Hevserokê Konseya Rêveber a KCK'ê Cemîl Bayik destnîşan kir ku wan AKP anîne ber mirinê û got, "PKK ji jin, ciwan, gel û baweriyên cîhanê re bûye hêvî.`
Hevserokê Konseya Rêveber a KCK'ê Cemîl Bayik tevlî bernameya Dilistan a ku di Radyoya Dengê Welat de tê weşandin bû mijarên di rojevê de nirxand.
Bayik polîtîkayên qirkirinê yên dewleta Tirk nirxand û anî ziman ku rejîma faşîst a AKP-MHP'ê komasiya hemû faşîstên berê temsîl dike û wiha dewam kir: "Li Tirkiyê gelek desthilatdar çêbûne û xwestine Kurdan, hêzên demokratîk qir bikin, tasfiye bikin. Lê dema mirov dîrokê lêbikole, mirov dibîne ku desthilatdariyeke wekî ya Erdogan û Bahçelî faşîst çênebûne. Wan desthilatdariyên di dema Tirkî heta di dema Osmanî û b itaybet jî di dema Îttîhat Terakkî de çi kirine, lêkolînkirin e. Wan tevan bi kar tînin û kêmasiyên wan jî dîtin e û li gorî wê tevdigerin. Ji bo wê jî kesekî wekî van dijminatî li Kurdan, li ragihandin, rewşenbîr, hunermend, akademîsyen, gelan, olan û hwd. nekiriye. Kesekî wekî van mirov ji saziyên dewletê, burokrasiyê û saziyên medenî dernexistine. Van hejmareke mezin mirov ji her tiştî mehrûm kirin e."

### JI TÊKÇÛNÊ DITIRSIN

Bayik, sedema zêdekirina zextên li ser civaka Tirkiyê û Kurdistanê jî wiha şîrove kir, "Bi vê dixwazin faşîzmê tam bidin rûniştandin. Dixwazin her kesekî teslîm bigirin. Yên ku teslîm nebin jî heqê jiyanê ji wan re nehêlin. Ji bo wê jî mayîn û nemayîna xwe wekî mayîn û nemayîna Tirkiyeyê didin nîşan dan. Dibêjin, 'qedera Tirkiyeyê girêdayî me ye, em biçin Tirkiyeyê jî diçe'. Bi vê Tirkiyeyê ditirsînin. Gel rehîn digirin."

### NÎJADPERESTIYÊ SOR DIKIN

Bayik, di mijara naskirina AKP'ê de hişyarbûn û guhertina di nava gelê Kurd de çêbûye nirxand û wiha dewam kir: "Ji xwe Kurd winda kirine.. Berê hinek Kurd li gel wan disekinîn. Wan Kurdan digot, 'ev ê pirsgirêka Kurd çareser bikin'. Lê dîtin ku ev dijminê Kurdan tevan e. Ne tenê dijminê PKK'ê ne. Li Bakur, Başûr, Rojava û li her derê. Li Bakur bajar talan kirin. Efrîn talan kirin. Li Kerkukê gotin 'aqilê xwe bînin serê xwe' û tehdît kirin. Vê tesîreke mezin li ser gelê Kurd kir. Di nava Tirkiyê de û li derveyî Tirkiyê jî nerazîbûn rû didin. Ji bo ku vê veşêrin nijadperestî, şovenîzmê, netewperestiyê sor dikin."

### ARTÊŞA PEREYAN NIKARE ŞER BIKE

Bayik şerê giran ê li çiyayên Kurdistanê nirxand û işaret bi têkçûna artêşa Tirk a dagirker kir: "Niha dewleta Tirk êdî nikare li hemberî gerîla li ber xwe bide. Dixwaze bi temamî bi teknîkê şer bike. Dixwaze wisa derbê li gel û gerîla bide. Dema ku balafir tinebin leşker dev ji cihê xwe berdidin û direvin. Nikarin şer bikin. Dixwazin canê xwe xilas bikin. Leşkerên ku niha dixin şer ên ku bi pereyan çêkirin e. Ger ku leşkerek bi pereyan şer bike, dema ku xeteriyê bibîne, xwe nake xeteriyê û direvin."

### PKK BÛYE HÊVIYA GELAN

Di dewamiya axaftina xwe de Bayik anî ziman ku desthilatdariya Erdogan û Bahçelî li ber mirinê ne û li ser rewşa PKK'ê jî ev nirxandin kir, "PKK ji bo gelên Rojhilata Navîn û sosyalîstên cîhanê bûye hêvî û pêşengtiyê dike. Hêviya her kesî PKK û paradîgmaya Rêber Apo ye. Her kes dixwaze vê fêhm bike û li gorî wê xwe rêxistin bike. Ji ber vê taybetiya PKK'ê bû her kes ji ber DAÎŞ'ê reviya lê wê ew anî ber dawîbûnê. Ev bi têkoşîna Rêber Apo û PKK'ê pêk hat."

### ŞOREŞ DI NAVA ŞOREŞÊ DE

Di dawiya axaftina xwe de Bayik, sirê berxwedan û mezinbûna PKK'ê û eleqeya gelên din jî bi van gotinan anî ziman, "Li Rojhilata Navîn ew jin çawa derketin û têkoşiyan? Gelan ev têkoşîn lêkolîn kirin û dîtin ku li pişt wan ew bîrdozî û felsefeya Rêber Apo heye. Ji bo wê jî dixwazin di wê bîrdozî û felsefeyê de xwe xurt bikin. Dixwazin ku PKK vê berxwedan û têkoşînê pêş bixin. Tevgerên sosyalîst dixwazin PKK pêngavên wekî Enternasyonala 1'mîn, 2'mîn û 3'mîn biafirîne. Ji ber wê ye li Arjantînê jin derketin û gotin, 'Hevala Sara (Sakîne Cansiz) rêbera me ye'. Jin û ciwan paradîgmaya Rêber Apo esas digirin. Gelên bindest, yên qels hemû wê esas digirin. Hemû kesên azadî û demokrasiyê dixwazin û armanca wan serketina sosyalîzmê ye vê paradîgmayê esas digirin. Ji bo wê jî tevgera me her ku diçe mezin û fireh dibe. Êdî ji çarçoveya Kurdistan û Rojhilata Navîn derketiye û di asta cîhanê de têdikoşe."

# Divê gelên Sûriyê li dijî fitneyan şiyar bin



Rûspiyên êlên Ereb ên Bakurê Sûriyê li dijî hewldana derxistina tevlîheviyan di navbera gelên Bakurê Sûriyê de, banga yekîtiyê kirin.

Di bin dirûşmeya ″Bi yek destî ber bi avakirina Sûriyeke yekbûyî ve″ Hêzên Ewlehiya Hundirîn a Bakurê Sûriyê bi rûspiyên êlên Ereb ên Bakurê Sûriyê re civiya. Civîn li salona Beylesan a navçeya Amûdê ya girêdayî Kantona Qamişlo hat lidarxistin. Di civînê de rewşa dawî ya herêmê hat nirxandin, her wiha bal hat kişandin ser girîngiya hevgirtina li dijî planên afirandina fitneyê di navbera gelê herêmê de.
Rûspiyên êlan bal kişandin ser planên qirêj ên li dijî gelên herêmê.
Yek ji rûspiyên êlên Ereb ên herêma Şedadê Munasir Seqûsî diyar kir ku rêjîma Baas û komên çete yên girêdayî dewleta Tirk hewl didin tevlîheviyê bixin navbera gelê Bakurê Sûriyê. Seqûsî wiha got, ″Rêjîma Baas, Rûsya û Tirkiye hewl didin gelê herêmê li hember hev bidin şerkirin. Divê êlên Ereb û Kurd ên herêmê li hember van planên qirêj ên li dijî gelê herêmê, hevgirtina xwe xurt bikin û bi yek destî van planan vala derxin.″
Yek ji rûspiyên êlên Ereb ên herêma Cizîrê Şêx Xalid Esîrî jî destnîşan kir ku dewletên dijmin dixwazin ewlehiya herêmên Bakurê Sûriyê derb bikin û ji bo bersivdayîna planên herêmî û navneteweyî, banga yekîtiyê li êlên herêmê kir.
Hin aliyên derve îdîayên wekî ″QSD′ê çand û zimanê Kurdî bi darê zorê li ser gelê Bakurê Sûriyê ferz dike″ belav dikin. Esîrî derbarê îdîayê de wiha got, ″Ev îdîa dûrî rastiyê ye û parçebûna gelê Sûriyê ramanc dike. Berevajî wê, li herêmên me sîstemeke demokratîk hatiye rûniştandin, her gelek bi zimanê xwe perwerdeyê dibîne. Li herêma Cizîrê jî 3 zimanên sereke ′Kurdî, Erebî û Suryanî′ hene. Ev yek nîşaneya demokrasiyê û rêzdariya li hember gelan e. Siyaseta ferzkirina yek çand û yek ziman ji aliyê rêjîma Baas ve dihat meşandin.″
Yek ji rûspiyên êlên Minbicê Mihemed Casim jî bal kişand ser girîngiya yekîtiya gelê Sûriyê li dijî dagirkeriya Tirk û wiha axivî, ″Dagirkeriya Tirk siyaseta qirkirin û guhertina demografiyê li Efrînê dide meşandin. Her wiha rojane li herêmê kiryarên dizîn, talan, kuştin û tecawizkirin pêk tên, cîhan jî bêdeng dimîne. Ji bo ku ev destwerdan rawestin, divê em yekîtiya xwe ava bikin, bersiva êrîşên li dijî Bakurê Sûriyê bidin û destûr nedin ku dewleta Tirk dagirkirina axa me rewa bike.″…*ANHA*

## Dengê me ji Demîrtaş re ye

Partiya Şoreşger (DP) diyar kir ku di hilbijartinên 24'ê Hezîranê de ew ê piştgiriyê bidin HDP û Selahattîn Demîrtaş. Lijneya Rêveber a Navendî ya Partiya Şoreşger a Yekgirtî li Tirkiyê daxuyaniyeke nivîskî belav kir û di daxuyaniyê de got ku ew ê di bin banê HDP'ê de têkevin hilbijartinê.
Di daxuyaniyê de hate diyarkirin ku li hemberî faşîzma AKP'ê ew ê di bin banê HDP'ê de têkevin hilbijartinê û hate gotin, "Em bang li hemû kesan dikin ku li dijî faşîzma AKP'ê dengê xwe bidin HDP û Selaheddîn Demîrtaş. Em bang li hemû kesan dikin ku bila her kes xwedî li qedera xwe derkeve û têkoşînê geştir bikin. Ew ê ne sindoq, lê têkoşîna gelên ku xwedî li qedera xwe derdikevin, encama hilbijartinê diyar bike."



# Em ê yekîtiya Sûriyê biparêzin

***Serokê Partiya Sûriya Pêşerojê Ibrahîm Qeftan diyar kir ku ew ê ji bo parastina sînorê Sûriyê û çareserkirina aloziyê têkîliyên bi dewletên cîran re xurt bikin. Qeftan wiha got, "Armanca me parastina yekîtiya axa Sûriyê , rizgarkirina axa Sûriyê ji dagirkeriyê û çareserkirina aloziya Sûriyê ye." Emê ji bo avakirina Sûriyeke demokratîk xebatên xwe bidomînin."***



Serokê Partiya Sûriya Pêşerojê Ibrahîm Qeftan diyar kir ku ew ê ji bo parastina sînorê Sûriyê û çareserkirina aloziyê têkîliyên bi dewletên cîran re xurt bikin.
Partiya Sûriya Pêşerojê li salona Zana ya bajarê Qamişlo civînek ji gelê Qamişlo re li dar xist. Civîn di bin dirûşmeya ″Sûriya demokratîk, pireng û nenavendî″ de hat lidarxistin. Di civînê de rewşa dawî ya herêmê hat nirxandin û armancên partiyê hatin şîrovekirin.
Di destpêka civînê de Serokê Partiya Sûriya Pêşerojê Ibrahîm Qeftan armanca ji avakirina partiyê wiha vegot, ″Armanca me parastina herêmê, yekîtiya axa Sûriyê , rizgarkirina axa Sûriyê ji dagirkeriyê û çareserkirina aloziya Sûriyê bi riya danûstandinên bi aliyên hundir û derveyî Sûriyê re ye″
Qeftan mijara têkîliyên bi dewletên herêmî û cîhanî re wiha vegot, ″Em hewl didin bi dewletên cîran wek Iraq û Tirkiyê re bikevin têkîliyê da sînorê Sûriyê were parastin, aloziya Sûriyê çareser bibe û koçber vegerin malên xwe.″
Di dawiya axaftina xwe de Qeftan diyar ku ew bi hemû keda xwe ji bo avakirina Sûriyeke demokratîk, pireng û ne navendî dixebitin… *ANHA*

# Girseya herî çalak ya HDP'ê ye

Demîrtaş ji girtîgehê bersiv da pirsên ANF'ê û got, "HDP'yî bi biryar in. Zext û zordarî nikare bi wan. Girseya herî wêrek û çalak, a ku bi xurtî kampanyayê bimeşîne wê ya me be." Demîrtaş xwest, her mal, her kargeh mîna buroyeke hilbijartinê bixebite.
Selahattîn Demîrtaş ku cara duyemîn e bûye namzetê HDP'ê yê Serokkomariyê, wê kampanya xwe ya hilbijartinê vê carê ji Girtîgeha Edîrneyê bimeşîne. Bi gotina wî, kampanya wê ji aliyê bi milyonan dildarên HDP'yî ve bê meşandin.
Demîrtaş ji girtîgehê bersiv da pirsên me.

### GIRSEYA HERÎ WÊREK Û ÇALAK A ME YE

Demîrtaş diyar kir ku îmkanê wî nîne li girtîgehê kampanyayê bimeşîne û got, "Ez ê tenê hewl bidim piştgiriyê bidim kampanyaya ku bi milyonan jin û ciwan li derve dimeşînin.



Ji ber Rewşa Awarte û newekheviya Erdogan, ji xwe hilbijartin wê bi rengekî adîl pêk neyê. Lê belê rewşa min bê edaletiyeke giran e. Bêguman gelê me wê pêşengiyê ji kampanyayê re bike û vê rewşa neyînî ji holê rake."
Demîrtaş bi bîr xist, ku yên fermana "HDP'ê di sindoqan de bifetisînin" dane, ji xwe li her derê zext û zordariyê dikin û got, "Lê belê HDP'yî bi rijd in, bi biryar in. Zext û zordarî nikare bi wan. Hûn ê jî bibînin; girseya herî wêrek û çalak, a ku bi xurtî kampanyayê bimeşîne wê ya me be."

### EM Ê HEWLDANÊN XWE YÊN JI BO TIFAQA DEMOKASIYÊ BIDOMÎNIN

Selaheddîn Demîrtaş işaret bi her du tifaqên rastgir ên li dora berjewendiyên teng li hev civiyane kir û got, "Ew tifaqên bê pîvan in. Bi tevlîbûna HDP'ê dikarîbû blokeke demokrasiyê ya xwedî pîvan bihata avakirin; lê belê partiyên din ne amade ne ku xwedî li bernameyeke demokrasiyê ya girîng derkevin. Xala wan a hevpar 'Tirkîtî' ye. HDP bi rengê xwe yê ji gelek nasname û çandan, ji xwe nedibû di nava çarçoveya Tirkîtiyê de cih bigire. Eger ew jî bi vê ferasetê tevbigeriyan, wê li Tirkiyê dest bi pêngaveke girîng a demokrasiyê bikira. Her du tifaq li ser bingeha îdeolojiya fermî ya dewletê ava bûn. Lê belê ji bo tifaqa demokrasiyê em ê bi her awayî hewldanên xwe bidomînin."
Di dewama hevpeyvînê de Demîrtaş bal kişand ser rewşa Meclîsê ku tevizî ye û got, "Rewş wê timî ne bi vî rengî be. Eger em karibin hê bi xurtî derbasî sîstema parlamenter a demokratîk bibin, wê meclîs hîn bi xurtî çalak û girîng bibe. Hem ji bo vê hem jî ji bo edaleta temsîlkariyê, divê HDP li parlamentê hebe. Bêguman gel wê biryara vê bide. Di vê mijarê de em bi gel piştrast in."

### DIVÊ SEKNEKE DÎROKÎ BÊ NÎŞANDAN

Li ser hewldanên HDP'ê yên ji bo tifaqa bi partiyên Kurdan û hêzên çepgir re Demîrtaş got, "Hevserokên me û rêveberiya me ya partiyê karê xwe yê di vî warî de didomînin. Ez jî hewl didim bi fikir û pêşniyarên xwe alîkar bim. Ji bo tifaqeke berfireh a li her du eniyan, hevdîtin dewam dikin. Hêvîdarim wê bi bandor be û encameke watedar bi dest bixe. Bi taybetî partî û tevgerên Kurdan pêwîste di vê demê de bi seknekе zelal û bi biryar li cem HDP'ê cih bigirin û sekneke dîrokî nîşan bidin."

### DIVÊ HER DER BIBE BUROYA HDP'Ê

Demîrtaş di dawiya hevpeyvînê de got, "Derfetên dewletê yên ku Erdogan wan bi kar tîne, li ber destê min nîne. Desteka medya, dadgerî, burokrasî û sermayeyê ji bo min nîne. Min timî pişta xwe spart gel û bi vî rengî siyaset kir. Niha jî ji gel piştast im. Wê bi milyonan mirov dîsa dakevin qadan û bi coş û kelecaneke mezin li nava malan kampanya bê meşandin. Her kes dikare buroya xwe ya hilbijartinê veke. Ji bo vê jî dikare ji rêxistinên me yên partiyê alîkariyê bixwazin. Ji bo buroya hilbijartinê, partiya me wê alîkariya materyal û pêdiviyan bide. Her kargeh, her mal divê bibe buroyeke hilbijartinê. Divê paceyên hemû mal û kargehan, hemû şaneşîn bi alên HDP'ê bên xemilandin.
Ji her hilbijartinê bêhtir amadekariya me ji bo al, afîş û posteran heye. Her HDP'yiyek dikare ji buroya hilbijartinê ya HDP'ê ya nêzî mala xwe van materyalan peyda bikin û mal û kargehên xwe bixemilînin. Gelekî girîng e ku em di vê hilbijartinê de moral, hêvî û wêrekiyê bidin pêş. Bila gelê me piştrast be; em ê teqez bi ser bikevin."

## Divê bê cudakarî efû bê xwestin



Hevserokê Giştî yê ÎHD'ê Ozturk Turkdogan, diyar kir ku ger li Îmraliyê maseya aştî û çareseiyê bê avakirin wê demê dibe ku efûya giştî bê rojeva Tirkiyê. Turkdogan xwest berî her tiştî xala 25'an a Qanûna Înfaza Ceza bê rakirin û girtiyên siyasî bên berdan.
Hevserokê Giştî yê Komeleya Mafên Mirovan (ÎHD) Parêzer Ozturk Turkdogan, diyar kir ku li Tirkiyê beriya ku efû bê niqaş kirin gelek rojevên din divê bên niqaş kirin û wiha got: "Divê berî her tiştî kanûnên ceza ji hev bên cudakirin. "
Turkdogan, li ser niqaşa efûyê rawestiya û wiha got: "Ger ku pirsgirêka kurd dîsa têkeve pêvajoya çareseriyê û maseya çareseriyê bê niqaşkirin, ger ku dîsa bi Abdullah Ocalan re pêvajoya diyalog û muzakereyê dest pê bike û ger li Îmraliyê maseya çareseriyê bê avakirin û Meclisa Tirkiyê peymana aştiye qebûl bike û li Tirkiyê serdemek nû bê destpêkirin, wê demê mirov dikare qala efûya giştî bike. Ji bo rûpelek nû li Tikiyê vebe mirov dikare li ser hemû mijaran niqaş bike. Ji bilî vê yekê em wekî parazvanên mafên mirovan li dijî kesên ku sûcê mirovahiyê kirine dê helwesta xwe berdewam bikin. Ji bo berpirsiyarên komkujiya Roboskê bên darizandin û cezakirin em dê israra xwe berdewam bikin. Ji bo kesên berpirsiyarê komkujiya jêrzemînên Cizîrê bên darizandin û cezakirin em dê israra xwe berdewam bikin. Lê ger ku bi OHAL û KHK'ê girtiyên edlî bên berdan û yên siyasî neyên berdan em nikarin liser efûya giştî niqaş bikin.

### DIVÊ BÊ CUDAKARÎ EFÛ BÊ XWESTIN

Turkdogan herî dawî destnîşan kir ku berî her tiştî pêdiviya Tirkiyê bi berdana girtiyên siyasî, hevşaredar, parlamenter û hevserokan heye û wiha bi dawî kir: "Em ji serokê MHP'ê Devlet Bahçelî re dibêjin "Başe Devlet Bahçelî hûn ji girtiyên qederê yên edlî re efûyê dixwazin, hûn çima ji rojnameger, girtiyên siyasî, parlementer, şaredar û parazvanên mafên mirovan û sendikavanan re efû naxwazin. Siyaset wisa nabe. Devlet Bahçeli, ji kesên tev li sûcên rûreşî û sûcê mirovahiyê bûne re dibêjin mahkûmê qederê. Lê ji deh hezaran kesên ji ber fikrên xwe tiştekî nabêje. Ger ku efûyê dixwazin divê cudakarî neyê kirin'…*MA*

## Navnîşana Efrînê, Berxwedan e

Ednan MISTEFA

Ev nêzî du mehe gelê Efrînê berxwedêr cih û warê xwe li pê xwe hêştine. Raste gel fîzîkî dûrî Efrînê ketiye, lê di warê ruhî û manewî de ev gelê berxwedêr kêliyekê ji warê xwe û ji bîranînê xwe bernedane. Ji ber li ber her kevirekî, li ber her darekî zeytûn û hinarê bîranînek û destanek qehremaniyê yên YPG'ê û YPJ'ê heye ku bûye navnîşana "Berxwedana Serdem'ê" ya gelê Efrînê. Derveyî vê yekê nirxandin û şîrovekirin ne raste.
Lê mixabin piştî vekişîna bi pilan a ji Efrînê gelek nerazîbûn û tewanbariyên cûda çêbûn. Ev yek tê weteya ku baş rewşa siyasî nexwendin û pêşeroj nedîtin derdikeve holê. Ji ber tişta ku me li Efrînê jiyan kiriye, di çarçoveya pilaneke navnetewî bû. Ne weke dihate diyarkirin ku dûrxistina YPG'ê an jî valakirina sînorê 'Tirkiyê' ji hêzên çekdar yên PKK'ê ye. Ji xwe yên wisa dinirxînin heman kesên ku rêvebiriya xweser a Efrînê tewanbar dikin ku çima Efrîn berdane.
Hêzên hegemonîk pilana dagirkirina Efrînê di çarçoveya berdewamiya pilangeriya navnetewî ya li dijî vîna gelê Kurd dane meşandin. Kurd bê îdradekirin û bê nasname hêştin yek ji pilanên tunekirina gelê Kurd e. Ev pilan du lingên wê yên sereke dane avakirin. Lingê yekemîn di 15 Şûbatê sala 1999'an de di kesayeta Rêber Abdullah Ocalan de, li dijî gelê Kurd dane meşandin û di encamê de Rêber Ocalan dîl hate girtin. Lingê duyemîn piştî 19 salan li Efrînê xwestin pêk bînin. Ji ber vê yekê bi Tirkiyê û komên çete yên di bin navê artêşa azad êrîş anîn ser kantona Efrînê. Di vav êrîşan de çawa di komploya yekemîn a 1999'an de her yek ji hêzên herêmî û navnetewî xwedî rolbûn, îro jî di êrîşa 20' çilê îsal ser Efrînê de heman hêzbûn. Weke diyar e, cih û dema pilangeriya navnetewî cûda ye, lê armanca wê yek e. Tunekirina û qirkirina gelê Kurd e.
Di vê çarçoveyê de xwendin û encam jê girtin erka her demokratxwaz û niştimanperwerekiye. Çawa ku gelê Kurd li tevahî cihanê Efrîn bi tenê nehîşt û gelê Efrînê jî xwedî li hêzên xwe yên leşkerî derket. Bi erk û misyonekî wiha em dikarin rihê berxwedanê zindî bihêlin. Li cihê ku em nîqaşên koşeyan, bêser û ber bikin û bêjin Efrîn binketî, Efrîn hate firotin, em li Efrînê şikestin; em niqaşa em çawa careke din vegerin Efrînê û tola şehîdên xwe hilînin pêşbixin. Derveyî vê yekê nîqaş kirin dilê dagirkeriya Tirk û çeteyên wê şakirine. Ji ber navnîşana Efrînê bûye berxwedan, bi rihê berxwedanê tekoşîn kirin û yekîtiya netewî pêşxistin, tê weteya ku vegera ser xaka azad a Efrînê.